Goçbarkirina Mihemed Uzun

Reşoyê Pîrê

Mihemed Uzun li bajarê Siwêrekê, sala 1953 ji dayîk dibe. M. Uzun, di zaroktiya xwe de, bi bajarê Amedê û gondên derdoa wê re têkildar dibe, lewrejî, hukariya kurdayetiyê lê kiribû. Piştî darbeya eskerî ya 12-ê Avdara 1971an, ew jî li Amedê li gel welatperwer û şoreşgêrên Kurd tê zîndan kirin û 8 sal ceza danê. Di sala 1974 an de, ji zîndanê tê berdan. Di sala 1976 an de, kovareke bi zimanê Kurdî û Tirkî, bi navê RIZGARÎ belav dike.Û dibêji ku, " Rojnemaevaniya min bi kovara Rizgarî re dest pê dike". Di beşê Kurdî de, giraniya xwe dida çand û edebiyeta Kurdî.

Di sala 1977 an de, berê xwe dide dûriyê, li Siwêdê bi cî û war dibe. Li wir birêvebiriya çend kovarên Kurdî-Siwêdî dike.. Ji sala 1985 an û pê ve, dest bi nivîskariya edebî dike . Berhema xwe ya yekem, romana **TU** , di sala 1985 an de,. Li Siwêdê diweşîne. Di dûre, pir roman û xebatên edebî dweşanîne.

Ji ber hedu brhemên wî " **Ronî mîna evînê, Tarî mîma mirinê" û " Kulîkên Henarê**", di sala 2001 an de, Pêşkêşî dadgeha ewlekariyê li Stembolê dibe. .

Berhemên M. Uzun, bi pir zimanan " Siwêdî, Almanî. Norwejî, Înglîzî, Tirkî û hin zimanên dî hatine werger û weşandin.
Mehemed Uzun di yekîtiya nivîskarên Swêdê û di dûre, di yekîtiya rojnemevanên Siwêdî û dezgeha navnetewî a Yekîtiya rojnemevanan de cî digre.

M. Uzun, di sala 2006 an de, bi nexweşiya qanserê dikeve, li Swêdê û dewletên Yekbûyî yên Emekîka tê dermankirin. Lê mixabin bê care ye. Jê re dibêjin ku, çend rojên te mane. Biryara xwe distîne û di 13-6-2006 an de, vedigere Amedê. Li Amedê tê dermankirin û rewşa wî baş dibe. Lê sedcar mixabin, di 11-10-2007 an de, jiyana xwe ji dest da. Bi beşdariya deh hezar kes û bi dirûşmên " H**evrêyê rojê bê mirin e, Gelê Kurd bi te serbilind e û Şehîd namirin**", li goristana deriyê Mêrdînê ya Amedê tê veşartin

Li gorî wesiyeta wî, li ser gorê, nivîskarê bi nav û deng, Yaşar Kemal, serokê koma DTPê Ehmed Turk, serokê KADEPê Şerefedîn Alcî axivîn.

Y. Kemal : " **M.Uzun, ji nifşê Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran û Evdalê Zênikê ye . Her li dijê şer derketiye. Ev şer dê di nêz de biqede" Memed romana Kurdî nivêsand. Ez di koka xwe de Kurd im, lê ne nivîskarê Kurd i m . Mihemed jib o zimanê Kurdî riya bistirî vekir**. Bi **qasîzimanêdayika xew, hênêtirkêjê bû. Herdu zimanên gelankir çavkanê**" .

Ş. Alcî : " **Ew gula Kurda ye…..Mihemed ji gelê xwe re ronahiyek bû….Miheded di nav êşan de jiya. Di girtîgeh û zênana de ma. Derbarê wî de gelek doz vebûn..Li welatê xwe hate sirgûnkirin….Mihemed bi awakî fîzîkî ji nav me barkir,ew di dilê me de ye".**

***Emed Turk*: " Mihemed deng û wijdanê gel bû….Di rêwîtiya xwe ya dawî de, xwest ku, ez, Yaşar Kemal û Şerefedîn Alçî li vir biaxivin. A rast axaftina me ne girîng e. Wî Peyama fikrên me cihê bin jî hatin cem hev. Diyalog girêdana bi hev re da. Daxwaza wî ketina nav diyalogê ya me bû"**

Li dawiyê, Stranvanç, strana " Dayê dayê" yak o li ser gora Ehmed Kaya gotibdaran re pêşkêşkir.

komêta rêvebir ya weşana Newrozê sere xwedî û hemî zimanhezan saxdike.